Daxuyaniya çapemeniyê

Ragihandina li ser "Konferansa PENa Navneteweyî li Amedê li ser Pirrengiya Çandî", Amed, Adar, sala 2005an.

PENa Navneteweyî bi keyfxweşî radigihîne, ku “Konferansa PENa Navneteweyî li Amedê li ser Pirrengiya Çandî” wek civîneke navneteweyî dê li Amedê di 21-24 Adara sala 2005an de cih bigire.

PENa Navneteweyî saziyeke nivîskaran ya gerdûnî ye û ji bêhtir 130 navendên ku di 100 dewletan de kar dikin, pêk tê. Ev Konferansa, ku bi amojgariya Komîsiyona Wergerandin û Mafên Zimên ya PENa Navneteweyî kete rojevê, dê 50-60 nivîskar, helbestvan, weşanvan û wergeran kom bike, da ku ew Pirrengiya Çandî û sûda wê gotûbêj bikin.

Wateya Konferansê ev e, ku xweşiya wêje û helbestê di ser sînoran re derbas bike û xwendin, wergerandin û goftigoyan bike gaveke biçûk, lê giring, ji bona avakirina Çanda Aştiyê. Ev yek li gor armanc û ramanên hevbeş yên PENa Navneteweyî û UNESCO ye. Civînên giştî û xwendina helbestan dibine beşek ji bernameya Konferansê. Em bala herkesî dikişînin ser peyamên birêzan Mehmed Uzun û Murathan Mungan û civînên girtî bi beşdarbûna wêjevanên hem ji Tirkiyê, hem jî ji derveyî Tirkiyê hatî.

Ev êdî 80 sal in, ku PENa Navneteweyî delîveyan ji bo hevkariyên wisa vedike. Ev Konferansa han jî bi hevkariya baş di navbera Navenda PENa Kurd û Navenda PENa Tirk de bi pêş ket. Ev civîneke yekemîn ya bi vî awayî ye û PENa Navneteweyî bi şanazî rist û alîkariya comerd ya Serokê Şaredariya Mezin ya Amedê birêz Osman Baydemir û tevaya Şaredariyê destnîşan dike.

Bername û Lîsteya Beşdaran li gor daxwazan têne belavkirin.

Şanenav:
Terry Carlbom, Ph.D, Berpirsê Taybet yê PENa Navneteweyî ji bo Konferansê,
Dr. Zedeşt Haco, Serokê Navenda PENa Kurd,
Üstün Akmen, Serokê Navneda PENa Tirk